



## Li 1 Gulan'ê Hêviyê Mezintir û Agirê Serhildanê Xurttir Bikin!

### Karker û Kedkarino!

Roja yekîti, têkoşîn, û peştevanî ya pola karkeran a navneteweyî 1 Gulan ji bo hemû kedkar û gelên cîhanê re pîroz û hevîdar bibe. **1 Gulan** manifestoya pol a karkeran a berxwedan û serhildanê ye; **rojekê binav û şanaz e**, ku piştî gelek bedêl ji bo cîhanekê wekhev û parvaker hatiye bidestxistin. Di vê rojê dîrokî de, peywîrekê birûmet e ku em ê qadan tijî bikinê û bi dirûşimên xwe ve di esman û erdê de deng vebidinê da ku em ê cîhanekê bêhtir jîyanbar û azad avabikin.

Em îsal 1 Gulan'ê di rewşên neyênî yên xerakirinên civakî ku jiber krîzê derdikevin û her belav dibin de peşwazî dikin. Lêbelê, polîtakayên desthilatdarên sermayedar ên ku ji bo derbaskirina krîzê li ser gelê didin hilpesartin rastî bervedanên girse yên karker û kedkaran tên. Çalakiyên berxwedanê û serhildanê yên girseyên karker û kedkaran her ku diçin mezintir dibin û helwestekê navneteweyî werdigerin.

**Di cîhana desthilatdaran de çi dibihûrin?:** Krîza îroyîn a navneteweyî carekê din destnîşan dike ku emperyalîzm bi taybetmendiyên xwe yên pûçbûyî, mijok, û bermiritî awayekê kapîtalîzma yekdestî ye. Ev pergala bêheqî û nedadî bivênevê her ku diçe dirize û krîzên nûhû diafirîne. Krîza aborî, krîza avûhewa, krîze enerjî, krîza parvekirinê, û krîza desthilatî hin mînakên krîzên wûha ne. Qaşo çareseriyên ku desthilatdar pêşkeş dikin her krîzên nûhû derdixin holê. Her roj yekdest, trost, holdîng yan jî bankayekî têk diçe û heta welatên wek mînak destnîşankirî jî bi hilweşînên aborî ve dihejin. Ji nav welatên EY jî, ya Yewnanîstan di serî de, aborîyên Macarîstan, Estonya, Letonya, Îzlanda, Îrlanda, Îspanya, û Portekîz di rewşên pir dijwar re derbas dibin. Bi diwarbûna krîzê ve, nakokiyên navxweyî yên desthilatiya burjûva jî kûrtir dibin. Neçariyên zêdebûyî hem di hundirê û hem jî di derveyê de burjûvaziyê berbi mîlîtarîzmê than dike. Krîza darayî û aborî dagerî zelzeleyekê civakî û tê xwastin ku fatûreya vê krîzê bixin ser piştê hemû kedkar û gelên cîhanê. Da ku krîza aborî damegere krîzekê desthilatî sepanên 'dewleta polîsî' yan jî 'terora dewletî' berfireh dibin. Hilweşînên civakî û siyasî tîr zêdetir kirin. Bi vî awayî demokrasî tîr qelstir kirin. Maf û azadiyên ku bi têkoşînê ve hatine bidestxistin yek bi yek tîr çopandin. Ji ber xetereyê ku 'krîzên civakî dabigerin serhildanên civakî' bujûvazî kabûsan dibîne û hewl dide ku bêhtir amûrên paşwerû bi kar bîne.

**Lê di eniya karker û gelê kedkar de çi dibihûrin?:** Di 2010'an de, ji ber krîzê hejmarên bêkarî û xizaniyê gîhan dîmenên erjeng. Li hemberî vê rewşê, li gelek welatên cîhanê, karker û kedkar çalakiyên çînî yên wek xwepêşdanên kolanan, grev(ên gelemperî), û dagirkirinên fabrîka û kargehan bi cîh anîn. Bervêdanên girseyên kedkaran hemberî kedxwarî, zordarî, û koletî her ku diçe mezintir dibin. Li hemberî çanda jibîrkirinê ku ji aliyê desthilatdaran ve tê hilpesartin, çanda serhildanê ji nû ve cîhanê dorpêç dike!

Ew hilweşandinên civakî bi awayên cûr be cûr ve li ber me derdikevin: şerên bêmaf, dagiriyên bixwîn, talanên bêsinor û kedxwariyên bêdestgîn, bêkarî, xizanî, bêtemînatîyên civakî, çopandinên mafên siyasî û hwd. Hikumatan hewl didin ku fatûreyên krîzê bixin ser piştê gel. Rewşekê wusa û li hemberî vê yekê têkoşîna birêxistinî hişyariya karker û kedkaran xurttir dibe. Dema ku krîzên kapîtalîzmê kûrttir dibin **SOSYALÎZM JI NÛ VE HÊVÎ DIBE**. Wek ku pratîka têkoşîn a yekgirtiya karkerên TEKEL'ê destnîşan dike, têkoşîna meşrû û mafdar dikane dîwarekê spartek avabike li hemberî êrîşên sermayeyê. Li dewsa cîhanekê kedxwar, hewla avakirina cîhanekê pardar her ku diçe bi hêz û lez dibe. Ji ber vê yekê jî peywîrekê kolektîf li ber derdikeve: divê em ê li 1 Gulan'ê û li demên din lêgerîna rizgarî ya çînî / civakî xurttir, dînamîktir, û bileztir bikinê.

**Li 1 Gulan'ê Hêvî û serhildanê mezintir bike,  
bila pergala kedxwarî, zordarî, û talanê hilbiweşe!**

**Bijî Yekîti, Têkoşîn, û Piştevaniya Karkeran!**